

Zewaca temen biçûk



KONGRA STAR
مۆتەر ستار

Naverok

Destpêk

Zewaca temen biçûk

Sedemên belavbûna diyardeya zewaca bi temen biçûka de

Bandora zewaca temenbiçûk

Qedexkirina zewaca zarokan li gorî peymanên navneteweyî

Wekhevî û perwerde ji bo pêşîlêgirtina zewaca zarokan



1. Destpêk

Zewaca di temenê biçûk de pirsgirêkek civakî ye ku hîn jî li gelek herêmên cîhanê heye. Li Bakur û Rojhilatê Sûriyê û li Sûriyê jî zewacên zarokan hîn pir zêde ne. Rêveberiya Xweser a Bakur û Rojhilatê Sûriyê mafê zarok û jinan diparêze û zewaca di temenê biçûk de qedexe dike, lê dîsa jî ev pirsgirêk di civakê de heye. Divê ev pirsgirêka ku ji zihniyeta bavixsalarî derdikeve, ji ber ku gelek encamên neyînî li ser jinê û civakê derdixe holê, were derbaskirin. Di raporta destê we de em ê li sedem û bandora zewaca di temenê biçûk de li ser jinên ciwan û civakê bal bikişînin.

2. Zewaca temen biçûk

Zewaca di temenê biçûk de diyardeyeke civakî ye ya zewaca keçan di temenê biçûk de, ango di bin 18 saliyê de, beriya ku bigihin mezinbûna laşî û derûnî ye. Zewaca zarokan rê li ber tundî, îstîsmar û bazirganiya zarokan ya herî xerab vedike. Bi awayên cuda bandorê li jin û keçan, malbat û civakên wan dike û bandorên neyînî li ser hemû aliyên jiyana jinan dike, ji civakî, aborî û tendurîştî heta perwerdeya jinan. Ji ber vê yekê zewaca di temenê biçûk de weke binpêkirina mafên mirovan û zarokan tê dîtin, keçan ji paşerojeke yê tê de xeyalên xwe pêk bînin bêpar dihêle û çerxa zext û ziyana li ser jinan di civakê de bi hêz dike. Li cîhanê zêdetirî 720 milyon keçan zewicî hene yê temenê wan di bin 18 saliyê de ne.

3. Sedemên belavbûna diyardeya zewaca bi temen biçûkan de

3. 1: Xizanî

Xizanî yek ji sedemên herî girîng ên belavbûna vê pirsgirêka civakî tê dîtin. Dê û bav keçên xwe ji bo sivikkirina barê aborî û gelek kes keçên xwe ji bo başkirina rewşa aborî ya malbatê bi kesên dewlemend re dizewicînin. Jin û keç objektê ji bo bazirganiyê tên bikaranîn.

3. 2 Adet û kevneşopî di civak de

Di gelek civakan de statûya jinê û rola wê kêmtir bûye, daxwaz û nêrînên wan nayên hesibandin. Gelek civakên paiverû keçên xwe li ser bingeha adet, kevneşopî û zihniyeten kevneperest ên bavixsalarî dizewicînin ku tê de keç ji bo malbatê wekî wesayîten şermê û/an rûmetê têne dîtin. Tê bawerkirin ku jin rûmeta malbatê hildigire û divê ev yek bê paraştin.

Tekiliyên zayendî ya jin/keçan beriya zewacê weke bêrûmetî tê dîtin û ji bo ev yek çênebe, keç pir zû tên zewicandin. Tacîz û destdirêjiya fizîkî an jî zayendî wekî devjêberdana exlaqî tê hesibandin û gelemperî jin sûcdar dike. Di rewşên destdirêjiya zayendî û destavêtinê de, gelek keç neçar dibin ku bi tacîzkar an tecawizkarê xwe re bizewicînin da ku malbatê ji şerma civakî an stigmatîzekirin biparêzin, bêtî ku li ser encamên derûnî yê keçan werin hesibandin.

Nemaze li gundan zewacên ji bo danîna peywendiyên xwînê di navbera malbatan de pir heye û di hin rewşan de dema ku endamekî malbata ku keç jê tê, endamekî malbata din kuştibe, keç wek berdêl têne radeştirin. Keçên biçûk mexdûrên van kevneşopiyan in. Gelek zilam li bûkeke pir ciwan digerin da ku bibin xwedî gelek zarok û heta ku dibe ji xortaniya xwe kêfxweş bibin. Zilam gelek caran jinên pir ciwan hildibijêrin da ku wan li gorî xwe perwerde bikin.



Fikra çandî ku jinên di temenek mezin êdî nema bên xweştin û dê heta hetayê tenê bimînin û bibe bar, tirs li ser keçikê çêdike ku di temenek pir zû zewacê hildibijêre.

3.3 Nezanîn

Yek ji wan faktorên ku di heman demê de dibe sedema zewaca zarokan jî nezanîna civakê ya ji bandora wê ye. Her weha asta perwerde rasterast zewaca keçikan bandor dike. Bo nimûne, eger ew bêtir xwenda be, ihtimala ku zû bizewice kêmtir dibe. Ev jî wisa ye ku zewaca di temenê biçûk de nahêle keçek bigihîje asteke baş a xwendinê, ji ber piştî zewacê, civak sînor û bendewariyan ferz dikin yê nahêlin biçin dibistanê. Dema ku keç dizewice yan jî nîşanlî dibe, mafê mêr an jî dergûstiyê heye ku ew nehêle keçek biçê dibistanê, bi vî awayî wê lawaz dike û ew nikare serxwebûna xwe bi dest bixe.

3.4 Şer

Tê zanîn ku jin û zarok qurbanîyên sereke yê şer û pevçûnan in, ku di warê fizîkî, derûnî û siyasî de rastî îstîsmarê tîr û gelek caran dibin qurbanîyên bazirganiya mirovan. Me dît ku di dema şer de ger jin mekanîzmayên xwe yê xweparastinê bi rêxistin nekin, gelek caran weke “xenîmetên şer” û koleyên şer tîr girtin. Ji bo keçên ciwan, di pir rewşan de, ev tê wateya zewaca bi zorê yê mafên mirovî binpêdike. Tîrsa dêûbavan ku tiştêkî wiha bi keça wan re çêbibe heye û gelek caran dibe sedem ji bo keçik zu tîr zewicandin ji bo pêşiyê were girtin. Di dema kirîza Sûriyê de hejmara zewacên temen biçûk bi rêjeyê mezin zêde bûye. Krîza siyasî û bêîstîqrariya li herêmê dibe sedema nebûna gihandina xwendinê, şert û mercên aborî yê xerab, û metirsiya tacîz, destavêtin, bazirganiya zayîndî û fuhûşê zêde dike. Van şert û mercan hişt ku malbat zewacên zû saz bikin da ku keçên xwe yê ciwan ji van xetereyan biparêzin.

4. Bandora zewaca temenbiçûk

4.1 Xetereyên tenduriştî

Pirskirêkên ducaniyê û zayîne sedema sereke ya mirina keçên zewicî yê di navbera 15 û 19 salî de ne. Di dema ducaniyê de, pir caran pirsgirêkên peydakirina bijîjkî ya rast derdikevin holê û xetera xwînwedna kirin zêde heye. Her sal 70,000 keç ji ber vê yekê dimirin. Herwiha metirsiya mirinê ji bo zarokên dayikên ciwan %50 ji zarokên dayikên ku piştî bîst saliya xwe welidînin zêdetir e.

Xetereyên di ducaniyê de û di dema zayîne de

Ducanîbuyin bi serê xwe zorê li laşê jinê dike, laşê ku ji bo zayîna zarokêkî gihîştî û amade tê dît. Ji ber ku laşê keçek ku mezin dibe hîn jî di bin gelek guhertin û pêşveçûn de ye, stresa normal a li ser laşê ku zarok tîr zêde dibe. Rêjeya komplikasyonên ducaniyê sê-pênc qat zêde dibe, û rêjeya mirina zikmakî jî gelek zêdetir e, rêjeyên jiberketinê, jidayikbûna pêşwext, hîpertansiyona bi ducaniyê û kêmbûna hesin jî zêde ye. Li gorî jinên mezin, keçên ciwan di metirsiya mirina di dema zayîne de ne, bi taybetî ji ber xwînrijandina piştî zayîne û seknandina jidayikbûnê. Ji ber laşê biçûk ê keçên ciwan, zirara mayînde bi encamên demdirêj pêk tê ku pirsgirêkên din ên civakî girantir dike. Rêjeya pir zêde ya zayînen qeyserî yê acil di ducaniyê di temen biçûk de dibe sedema pirskirêkên din û gelek ji van faktorên xetereyê hem ji bo dê û hem jî ji bo zarokê girantir dike.



Xetereyên ji bo zarokê nûbûyî

Metirsiyek ji bo zarokê nûbûyî heye ku îhtîmalek zêde ya bêteşebûnê û mesinbûnê qels e hebe. Dayîkên westiyayî bêhtir zarokên pêşwext û kêmkîlo ji dayîk dibin û rêjeya mirina zarokan jî zêdetir e.

Îzolasyon û depresyonê

Zewaca di zaroktiyê de tê wateya windakirina zarokatiyê, windakirina derfeta lîstik û hevaltiyê û hesta redkirina ji ber cudahiya temenî ye. Zarok jî divê barên ku nikare bi ser bikeve hilgire, ev jî dibe sedema têkçûn û bêbaweriya xwe, ev jî dibe sedema îzolasyon û depresyonê.

4.2 Bandorên Civakî

Pir kes zû dizewicin ji bo ew jiyanek aramî û xaniyek ji xwe re dixwazin, lê heke zewac pir zû be çi dibe? Mirov gelek caran encam û pirsgirêkên ku di temenek wusa piçûk de ew qas berpirsiyarî hildigirin paşguh dikin. Piraniya zewacên zû di navbera keçên ciwan û zilamên bi temen mezin de têne kirin, bi gelemperî qonaxek ji bo şideta nav malê û xetereya laşî li ser jinan ava dikin.

Ev dibe sedema bandorên psîkolojîk ên mayînde û nexweşiyên derûnî ya keçik. Ji ber vê yekê zewaca di temenekî biçûk de nikare weke pirsgirêkeke şexsî bê hesibandin, lê pirsgirêkeke civakî bi gelek bandorên neyînî li ser civakê, saziya malbatê û pêşketina civakî dike.

Keçên ciwan di esasê xwe de neçar in ku xortaniya xwe, qonaxek girîng a jiyanê ku bi keşfkirîne ve tête diyar kirin, bitepisînin. Piraniya keçan ji ber zewaca di temenê biçûk de raştî gelek pirsgirêkên civakî tên. Dema ku ew qonaxa girîng a pêşketinê tê tepisandin, dibe sedema windakirina nasnameya wan a civakî, nebûna perwerdeyê û nekarîna bi rêkûpêk mezinkirina zarokên xwe. Ev hemû jî di nav civakê de dibe sedema pirsgirêkên nû û demdirêj. Kêmbûna ezmûna jiyanê ya keçikê dibe sedema pirsgirêkan di jiyanê navmalî de, di ezmûna dayikbûnê û di lînerîna zarokan de. Ji ber ku ew bi xwe hîn zarok in, dibe ku nikaribin xwe bi sohbetên mezinan re biguncînin, bi malbata nû re mijûl bibin û adetên nû bişopînin. Pirsgirêkên bi vî rengî pirskirêkên bi mêr û malbata nû re girantir dike û gelek caran dibe sedema şidetê li dijî wan.

Bandorên aborî û perwerdehiyê

Aliyê zewacê ji bo ewlehiya aborî ji malbatê re peyda bike, ligel nebûna serbixwebûna keçê, dihêle ew bi karên malê ve were girêdan û ji hêla aborî ve girêdayî be. Zewaca di temenê biçûk de dibe sedem ku ciwan dev ji dibistanê berdin. Gor fikra civakî ev e ku cihê guncav ji bo keçekê mala mêrê wê ye tê dîtin, ji ber vê yekê ne hewce ye ku ew xwendina xwe biqedîne. Lê belê, pêwîstiya lezgîn bi pêşxistin û parastina wan heye û derfetê dayin ji bo derbasî kar bibin û serxwebûna xwe bi deşt bixin. Ger jina ciwan bikeve karek jî, bawernameya wê ya lîseyê tune ye, ev jî dibe sedema kêmbûna fon. Bandora neyînî ya aborî ya zewaca di temenê biçûk de bandorê li hemû aliyên jiyanê wan a şexsî û jiyanê civakê bi giştî dike.

Bandorên psîkolojîk li ser zarokên ji dayikek temen biçûk

Di zewaca temenbiçûk de barê giran ji dayika hîn pir ciwan bandorê li zarokên wê dike. Ji ber sedemên ku li jor hatine behs kirin, zewaca di temenê biçûk de dibe sedema peydabûna pirsgirêkên tendurîstî û derûnî û bi vî awayî bargiraniyek ji bo tevahiya civakê û zarokan.



5. Qedexkirina zewaca zarokan li gorî peymanên navneteweyî

Ji bo rêgirtin li belavbûna zewaca di temenê biçûk de yê wek bînpêkirina mafên zarokan tê dîtin, li welatên cuda gelek peyman û peyman hatine îmzekirin, yê zewaca di temenê biçûk de qedexe dikin û weke tawan û bînpêkirina mafên zarokan bi nav dikin.

Li vir çend nimûne tene destnîşan kirin:

1. **Peymana Navdewletî ya Kaido:** Zewaca zarokan sûcdar dike û neqanûnbûna wê di maddeya 162 de piştraşt dike (destgirtbûn û zewaca zarokan bingehek yasayî nîne û li gorî vê yekê divê qanûnên pêwîst ji bo destnîşankirina temenê herî kêmtir ji bo zewacê bê diyar kirin).

2. **Peymana Afrîkî ya li ser Maf û Refaha Zarokan** qedexekirina zewaca keçan di xala 21-ê de tîne ziman (qedexekirina zewaca zarokan û derbasbûyîna û kur û keçan beriya 18 saliyê).

3. **CEDAW** (Peymana Navnetewî ya Rakirina Hemû Cêwaziyên Dijî Jinan) Di nav xalên wê yê herî girîng de: rakirina hemû ceza û bendên ku çûdakarî li jinan dikin, garantîkirina hemû mafên wan ên yasayî, betalkirina hemû qanûn û kevneşopiyên ku jinan red dikin, û misogerkirina pêşketinê. jin di hemû qad û qadên jiyane de.

4. **Peymana Mafên Zarokan:** Civata Giştî ya Neteweyên Yekbûyî di sala 1998'an de Peymana Mafên Zarokan pejirand û di sala 1990'an de ket meriyetê. Armanc ew e ku kampanyayêke nimûneyî ji zarokan re pêşkêş bike û paraştin û geşepêdana wan bi awayekî saxlem, xwezayî û civakî û rêzgirtina ji azadî û rûmeta wan re bê cudahiya zayendî, ol, etnikî û her aliyekê. Di nav xalên wê yê herî girîng de: ji bo hemî polîtîka, tedbîr û prosedurên ku di derbarê mijarê de tene girtin de, berjewendîya herî baş a zarok tê girtin. Li berçavgirtina mafê zarokê ji bo bikaranîna mafên xwe û beşdarbûna wî di hemû mafên wî yê girêdayî. Pabendbûna bi wekheviya hemû zarokan bê cudahî bi her awayî û her wiha xebat ji bo paraştin û pêşxistina zarokan.

5. **Zagona Jin** ya Desteya Jin a Rêveberiya Xweser a Bakur û Rojhilatê Sûriyê: Bi destpêkirina şoreşa Rojava û tevlibûna aktîf a jinan di nava wê de, pîrsgirêkên civakê bi taybetî yê têkildarî jinê hatin analiz kirin. Di vê çarçoveyê de Meclîsa Jinan qebûl kir ku qanûnek ku mafên jinan û malbatê bi giştî biparêze were amadekirin. Ji bo vê yekê jî Encûmena Jinan reşnivîsa yasaya jinan amade kir, ku tê de komêk pîrensîp û kontrolên exlaqî û herwiha mekanîzmeyek ji aliyê ku qanûnê bînpê dikin, pêk tîne. Yek ji mijarên sereke yê qanûnê li ser zewaca keçan bû.

6. Wekhevî û perwerde ji bo pêşlêgirtina zewaca zarokan

Pêwîste hesasyet hem li gel jin hem jî tevahiya civakê li ser encamên zewacên zarokan were çêkirin, ji bo nêrîna qalibê yê di civakê de serdest e were guhertin. Perwerdekirina raya giştî li ser temenê qanûnî yê zewacê û tendurustîya zayendî û zayînê, û her weha bandorên zewaca zarokan û daxwazkirina dêûbavan ku li bendê bin heya ku keçên wan mezin bibin ji bo zewacê pir girîng e. Ji bo li dijî vê pîrsgirêka civakî ya zewaca zarokan, divê wekheviya zayendî di qonaxêke destpêkê de pêk were. Ji bo ku keç û jin bê cudahî beşdarî jiyana aborî, civakî û siyasî bibin, divê azadiya jinê pêş bikeve.



KONGRA STAR
مؤتمر ستار

Peywendî:

Email: info@kongra-star.org

Malper: kongra-star.org

Twitter: [@starrcongress](https://twitter.com/starrcongress)

Facebook: [Kongra Star Womens Movement](https://www.facebook.com/Kongra-Star-Womens-Movement)